# Demên bendewariyê ji bo we yên ku ji Sûriyê ne û daxwaza penaberiyê (asyl) kirine

**Gelek daxwazker demeke dirêj li benda bersiva daxwaza xwe ya penaberiyê mane. Em dizanin ku li bendêmayin zor e.**

## Ev in dosyeyên ku em niha li ser wan dixebitin

Heta havîna 2026'an em li daxwazên penaberiyê (telebên) yên wan kesên ku di salên 2023 û 2024'an de daxwaz kirine dinêrin. Lê em ê nikaribin hemû dosyeyan heta havînê biqedînin.

## Tê werî agahdarkirin dema ku tu ji bo hevpeyvînê werî gazî kirin

UDI niha dîsa dest bi mi'alecekirina daxwazên ji Sûriyê kiriye. Em ê te agahdar bikin dema ku dora te hat bo hevpeyvînê. Ne hewce ye ku tu bi me re têkiliyê daynî, em ê bi te re têkiliyê daynin.

Gelek kes di dora bendewariyê de ne, ji ber vê yekê dibe ku demeke dirêj derbas bibe berî ku tu werî gazîkirin ji bo hevpeyvînê. Hin kes jî divê demeke dirêjtir ji caran li benda bersivê bimînin piştî kirina hevpeyvînê. Ev jî ji ber ku mi'alecekirina dosyeyan demeke dirêjtir dixwaze ji ber ku em neçar in dosyeyên wan li gorî rewşa nû ya welatê wan binirxînin.

## Hin kes dikarin berî te biçin hevpeyvînê û bersivê bistînin, her çende wan piştî te daxwaza penaberiyê kirine

Rewşa li Sûriyê gelek guhertiye. Ji ber vê divê UDI dosyeyên penaberan li gorî vê rewşa nû binirxîne û bibîne ka ev guhertin ji bo kes û komên cuda tê çi manayê. Em divê bi kesên bi paşxaneyên cuda re ku di demên cuda de hatine Norwêcê biaxivin. Ji ber vê yekê dibe ku tu bibînî ku hin kes berî te hevpeyvînê dikin, her çende wan piştî te daxwaz kirine. Hin kes jî divê demeke dirêjtir li benda bersivê bimînin piştî kirina hevpeyvînê.

## UDI çawa dosya te mi'alece dike?

### Hin dosye zûtir têne mi'alecekirin

Gelek kes ji welatên cuda daxwaza penaberiyê dikin. UDI nikare hemû daxwazên penaberiyê di demekê de mi'alece bike. Daxwazên hin komên daxwazkeran divê zûtir bêne mi'alecekirin. Yên ku dikevine ber vî tiştî ev kes in:

- yên ku daxwazên wan li gorî peymana Dublinê têne mi'alecekirin, ku di piraniya rewşan de divê daxwazkerê penaberiyê here welatekî din ê Ewropayê da ku dosya wî li wir were mi'alecekirin

- yên ku UDI bi awayekî eşkere dibîne ku ne hewcedarê penaberiyê ne, mîna kesên ku ji welatekî ewle ne û dikarin zû vegerin welatê xwe
- malbatên xwedî zarok û zarokên ku bêyî dê û bavên xwe an kesên ku ji guhdana wan berpirs in, hatine vir, bi gelemperî divê dosyeyên wan zûtir bêne mi'alecekirin

Ger tu ne ser bi yekê ji van koman bê, dibe ku demeke dirêj derbas bibe berî ku tu werî gazîkirin bo hevpeyvînê û daxwaza te were mi'alecekirin. Ev nayê wateya ku di dosya te de tiştekî xelet heye an jî me tu jibîr kiriye.

### Dema ku tu li Navenda Gihîştina Penaberan a Neteweyî dimînî

Hemû kesên ku li Norwêcê daxwaza penaberiyê dikin, pêdivî ye ku pêşî daxwaza xwe a penaberiyê li Navenda Gihîştina Penaberan a Neteweyî (Nasjonalt ankomstsenter ) tomar bikin. Li vir tê tenê demeke kurt bimînî, ji ber ku divê cih ji bo kesên ku nû dighin were valakirin.

Piraniya kesan divê herin kempên penaberan yên asayî ('adî) û li wir li benda hevpeyvînê û bersivê bimînin.

Tu weku daxwazkerekî penaberiyê, nikarî hilbijêrî an tasîrê bikî li ser ka dê hevpeyvîn bi te re li Navenda Gihîştina Penaberan a Neteteyî were kirin an na. Ev girêdayî ye bi hejmara kesên ku di eynî demê de weku te daxwaza penaberiyê kirine.

### Dema ku tu li kempa penaberan a asayî dijî

Eger berî ku tu biçî kempeke asayî, UDI bi te re hevpeyvîn nekiribe, dibe ku demeke dirêj derbas bibe berî ku tu werî gazîkirin bo hevpeyvînê û bersiva daxwaza te were dayîn.

Bandora cihê lêjiyanê li Norwêcê li ser demên bendewariyê tune.

### Eger tu li navnîşaneke taybet bijî

Eger tu li navnîşaneke (adrêseke) taybet bijî, wekî li cem malbatê an hevalan, dê demên bendewariyê her weku yên kesên ku li kempên asayî dijîn be. <u>Girîng e ku tu navnîşan, e-name (e-mail) û hejmara telefona xwe bidî me</u>, da ku em bikarin ji bo hevpeyvînê û bersivê bi te re têkiliyê daynin.

## UDI çi bi dosya te dike di wê demê de ku tu têde li benda bersivê yî?

Dema ku tu daxwaza penaberiyê dikî, em daxwaza te dixin rêza bendewariyê heta ku dem bi yekî ji xebatkarên me re çêbibe ku li dosya te binêrê û wê mi'alece bike. Ev tê wê wateyê ku dosya te li UDI hîn ne di destê kesekî diyarkirî de ye heta ku tu werî gazîkirin ji bo hevpeyvînê. Lê piştrast be, em tu dosyeyan jibîr nakin.

## Çima kirina hevpeyvînê bi te re wextekî dirêj dixwaze?

UDI demeke dirêj diveqetîne ji bo hevpeyvîna penaberiyê, bi gelemperî rojeke temam. planekirineke mezin ji her dosyê re lazim e. Ji ber vê yekê kirina hevpeyvînê bi hemû kesan re ku têne Norwêcê wextekî dirêj dixwaze.

## Çiqasî piştî hevpeyvînê bersiv tê dayîn?

Di piraniya dosyeyan de UDI dikare zû piştî kirina hevpeyvînê bersivê bide. Lê hin caran em neçar in demeke dirêjtir bikar bînin. Dibe ku lazim bibe ku em hûrtir li agahiyên ku te dane me binêrîn, an jî dibe ku rewşa welatê te li me ferz bike em zêdetir li ser rewşê bizanin berî

ku em dosya te mi’alece bikin. Di rewşeke wisa de dibe ku dayina bersivê wextekî dirêjtir bixwaze. Lê hemû kes dê bersivê bistînin.

## Gelo tiştek heye tu dikarî bikî da ku dosya te zûtir bi pêşve here?

Eger li cem te belgeyên (wesîqeyên) nasnameyî hene ku te hîn ne dane polîs, divê tu wan di zûtirîn wext de radestî polîs bikî.

- Eger di destê te de belgeyên orîjînal hebin, divê tu wan radestî polîsê herêma xwe bikî
- Eger di destê te de kopî an wêneyên belgeyan hebin, divê tu wan ji UDI re bişînî

Girîng e ku hemû belgeyên ku di dosya te de ne bighin destê UDI berî hevpeyvînê. Bi vî awayî tu dikarî alîkariyê bikî ku mi’alecekirina dosya te demeke dirêjtir ji pêwist negre.

## UDI dikare çi agahiyan li ser demên bendewariyê bide te?

Gelek kes bi UDI re têkiliyê dikin da ku li ser demên bendewariyê bipirsin. Em nikarin li ser telefonê tu agahiyên din ji bilî yên ku li ser malpera udi.no hene bidin te.

Eger ji bo mi’alecekirina dosya te agahiyên zêdetir hewce bikin, em ê bi te re têkiliyê daynin.

## Gelo daxwaza te a penaberiyê dikare di dorê de were pêşxistin?

Piraniya kesên ku daxwaza penaberiyê dikin dixwazin ku dosya wan zû were mi’alecekirin. Divê tiştekî pir taybet di rewşa te de hebe heta ku daxwaza te a penaberiyê were pêşxistin di dorê de.

---

## Nûkirina agahiyan

Cara dawî agahî di nîsana 2026an de hatibûn nûkirin.

Ev agahî dê berî 1ê tîrmeha/temûza 2026’an werin nûkirin an jî zûtir eger guhertinên mezin çêbibin.